


Li Kurdistanê azadiya ramanî di xeterê de ye

# Kerîm Sincarî da ser şopa Mac Carty

Wezîrê  
hundir  
Kerîm  
Sincarî




Rûpel 7

# PEYAMA Kurd

Hejmar 49 | 12.08.2005

Kurdish weekly newspaper



**Mesûd Barzanî:  
Ez  
û Celal Talabanî  
xwediyê yek nêrîn  
û yek helwestê ne**

Rûpel 8

**Yewnan û Tirkan liser  
çiyayê Agirî li hevdu  
nekirin**

Rûpel 3

**Îranê derbeya talî ji  
Rûsyâ xwar**

Rûpel 4

**Welaṭî xo nas biker:  
Çołig**

Rûpel 16

**Xwarina fêkiyan  
îhmal nekin**

Rûpel 13



D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR  
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKK  
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1.70 EUR



**Buroya  
Alîkariya Civakî  
ya Kurdistanê  
liser kar e**

Rûpel 8

# Dîroka Vejetaryanî



## Fadil Özçelik

**L**i gorî vejetaryana dîroka vêjetaryanî bi seruvena (macerâ) mirovatîyê liser erdê destpêdiye. Jiber ku însan jî wek meymûnan bi milyon salan li daristanê tropikal jiyane û tenê bi mîwe û şenayiyê jiyana xwe berdewam kirine.

Lê jiber sedemên wek erdhej û yên mayin bi wextê re mirov mecbûr mane ku dem dem cihê xwe biguherînin ango koçber bibin. Gava avhewa (iklim) tê guherandin mirov carna mîwe nabîne ku bixwe û ji wê çaxê ve jibo têrkirina zikê xwe dest bi kuştina heywanan dike. Pişti ku agir dibîne hezkirina mirov

ya goş zêdetir dibe û pê re jî kuştina heywanan.

Prof. Bunge di derbarê vê mîjarê de di pirtûka xwe ya bi navê, "Le Droit c'est la Force de weha dinivise: "Berî demêîn însanî, bapîrê mirovan wek hin curêñ meymûnan liser daran dijîyan û bi mîwe (fêki) zikê xwe têrdikirin. Bedene mirov jî vê yekê îsbat dike. Jiber ku mirov xwedî roviyên ku mîwe û gîha dixwe ye. Însen pişti ku dev ji jiyana xîjende (serzîki) berda û rep sekinî (xwe rast kir) xwarina wî jî guherî û destpêkir ku goş û nebatian bi hevdu re bixwe. Lê bi vê guherandinê re mirov nexwesi jî nas kir. Jiber ku ji xwarina goş re roviyên

kurt divê. Jiber ku rîya boriya mehandinê gelekkî dirêje goş di virde di demek kurt de xira dibe."

Prof. Foye jî di vê mîjarê de bi raya Bunge re ye. Prof. Foye dibêje: "Li gora anatomiyê mirov yekem ne goştxwur lê mîwexwur bûn. Wek ku Gustan idia dike ne dirinde (hov) lê sakîn bû. Gur hevdu naperiqînîn. Şer û piling jî weha. Ne diyare ku ev pêwistîya ne xweristî (tebîi) ji ku di mirov de peyda bûye. Berberiyen ligel qebileyen hov wek xirabî li jinan kirin, pê re dayina pêwendiyen hêşîran (dil) û pişti ku hat temenekî xwarina jinan di destpêkê de tune bû..

Em ji mîjarê bi dûr nekevin. Wek ku li jor eşkere dibe vejetaryanî ne tiştekî nû ye. Di her deman de çetîrîn zanyar, hemû pêxember, rîberê baweriyen cuda, kesen ku bi bilindkirina sewiya ehlaq û zihînê mirov re mijûl bûne bi vejetaryenbûna xwe hatine naskirin.

Wek ku di dîrokê neteweyan de jî diyar dibe, bilindbûn û ketina wan ya di warê fikir de gelekkî bi xwarina wan re jî girêdayî ye. İro jî ramangerên mezintir û ji huner heta siyasetê hemû kesen bi dav û deng hema eynî xurikan dixwin. Wek mînak em dixwazin li vir çend navan bi rîz bikin. Buda, Zerduş, Pisagor, rahîbê agirperesten Irani, zanayen Hindî, kahînen Misirî, filozofen Grekî, Homer, Sokrat, Eflatûn, Arîsto, Plutark, Epikur, Seneca, Pelin, Markorol, Virgil, Zenen, ruhanen Mesîhi Krizestem, Sen Koleman, Daleksandri, filozof, alim û metasavvifîn İslâmî Hz. Elî, Ebû Elî Sîna, Nasir Husrev, Şex Nejmeddin Razî, Mevlana, Yezidi, Mezdekî, Bacon, Kornaver, Gasandi, Milton, Sudenberg, Newton, Paskal, Monteyn, Jan jak Ruso, Lamartin, Vagner, Tolstoy, Faber, Volter, Edison...

Gelek ol û bawerî mirovan ji xwarina goş bi dûr dixe. Hindistaniyê Brahma û Bûdist işpat dikin ku bê xwarina goş ji jiyan mimkun e. Heta jê wêdetir rahîbê wan ji hemû xwarin û vexwarina heywanan dûrin. Jiber ku heywan ligel wan miqedes bûn. Pisagor ev bawerî gihad heta Yewnanistanê. Hin pirtûk idia dikin ku Arî bi tevâyî goş nedixwarin. Di pirtûka Hindîyê Manavad Harma Sastra de kesen goştxwur bi şeytanê ku ji vexwarina xwînê têr nabe tê gunehbarkirin. Yekem yaseya Buda weha ye: Nekujin, bi evînê

dagirtî bin. Çembera peresana zindîyan xira nekin."

Zerduş di şîretên xwe de, kuştina heywanen bêzirer yê Ahuramazda afirandine bi ci-nayetek qirêj binavdike. Di Avesta de çandînî yekem karê mirov yê pîroz e. Her weha pesnê mîwexwur bûn. Wek ku Gustan idia dike ne dirinde (hov) lê sakîn bû. Gur hevdu naperiqînîn. Şer û piling jî weha. Ne diyare ku ev pêwistîya ne xweristî (tebîi) ji ku di mirov de peyda bûye. Berberiyen ligel qebileyen hov wek xirabî li jinan kirin, pê re dayina pêwendiyen hêşîran (dil) û pişti ku hat temenekî xwarina jinan di destpêkê de tune bû..

Şex Mihemed Xalid jî fermandabû ku li Kurdistanê kes kewan, teyr û tilûran û maran nekuje. Bi tenê nêçîra masiyan serbest bû.

Di pirtûka Debistan de weha hatiye nîvisandin: "Yezîdiyê mezin goş bi devê xwe nedîkirin. Jiber ku xwarina goş ne taybetiyek mirov e. Kengî jibo xwarinê bikuje, ev taybetî wê bibe perçek ji qareketê wî û wê dirindetiyê bi xwe re bîne."

Horas dinivise ku Arfe jibo dirindetiyâ Grekan ji ser wan rake xwarina goş qedexe kiriye. Hz. Elî jî weha dibêje: "Aşika (mîdê) xwe nekin goristana heywanan."

Ka em guhê xwe bidin filozofê

Yewnanî Plutark jî : "Tu ji min re pirsa jibo ci Pisagor goş naxwe dikî. Lê berevajî ez ji te dipirsim: Gelo kîjan mirov cara yekem cesaret kir ku goştê mirî bibe devê xwe? Jiber ku liser sifreya wî cesed û laş hene. Lebaten zindiyen ku demek berê dinêri, dimeşî û direvî. Çavên wî çawa tehammulî dîmena kuştinê kir? Çavên wî çawa li herikandina xwînê, li gurandina çerm û perçe perçe kirina heywanê nihêri? Hün tîyên xwîna heywanen bêguneh in. Lê tu zirara wan nağîhe we. Ew fêrî we dibin, bi we re dixebeitin, baweriya xwe bi we tînin û hevaltiyê bi we re dîkin. Lê hûn bi şerjêkirin û xwarina goştê wan işpat dîkin ku divê bawerî bi we nebe.

Ey mirovê li dijî xweristê tevdigere. Ma tu jibo xwarina hemcinsen xwe bixwî hat afirandin?"

Prof. Gasendi di nameyek xwe de weha dinivise: "Diranên mirov ne jibo xwarina goşte. Jiber ku diranên goştxwaran tûj, dirêj û ji hevduqetiyâ ne. Diranên şer, piling, seg, guran weha ne. Lê diranên mirovên ku jibo xwarina mîwe û sewze hatine afirandin, kurt û nêzîki hevdu ne.



# Yewnan û Tirkan liser çiyayê Agirî li hevdu nekirin



PK - Grûbek çiyagerên Yewnanî jibo ku hilkişin Çiyayê Agirî ya ku bi 5 hezar û 138 metreyî bilindirin çiyayê Kurdistanê ye di 8ê mehê de bi balafirê hatin Wanê.

Lê rêvebirên Tirkan bi maneya ku destûra çiyagerên Yewnanî nîne nehiştin ku ew xwe bigihîn Agirî.

Lê çiyagerê Yewnanî Janni Konstantino ev agahdarî tekzîp kir

û eşkere kir ku wan destûr wergirtine.

Konstantino pirsa rojnamevanekî Tirk, „jiber ku hûnê alaya Yewnanî li zîrweya Agirî biçikînin destûra we hat iptalkirin?“ weha bersivand: Ev pirsgirêka alayê ji ku derket ez nizanim. Li hemû dînyayê adete ku wexta çiyager xwe digihînîn zîrweya çiyayekî li wir him alaya welatê xwe û him jî alaya welatê ku ew

lêne diçikînin û li wir sûretan dikşînin. 3 sal berê di mehek Tebaxê de tîmek çiyagerên Tirk hilkişyan çiyayê Olimpos û li wir him alaya xwe vekirin, him sûret kişandin. Me jî ew pîroz kîrin.“

Belê li welatê Kurdan, li Kurdistanê Tirk û Yewnanî li hevdu nakin ku ka li zîrweya Agirî alaya Yûnaniyan dikare bê vekirin an na!

## Mozên hingiv hatin xezebê

PK - Li navçeya Sorekê piştî qelibandina gerdêleka (parxêl-ereba hespan) bi gurbikan (jibo mêsên hingiv) barkirî mozan bi deh kesan veda û ew birîndar kîr.

Di serê sibeha 8ê mehê de du malbatan bi du erebeyên hespan xwestin gurbikên xwe ji Sorekê bibin gundê xwe. Piştî ku ji Sorekê derketin gerdêlek qelibî. Bi qezê re gurbik şikestin û mêsên di hundurê gurbikan de bela derûdorê bûn.

Sorekiyên li wir 9 kesên ku di herdu erebeyan de bi pêvedana mozan birîndar bûn rakirin nexweşanê. Ji wan rewşa Cengiz Agirtas girane.

Herdu hesp jî mirin.

## Mûş şoraxî dibe!

PK - Li gora daxuyaniya Serokê Weqfa têkoşîna li dijî erozyonê beşa Mûşê Ihsan Aytemîş li Mûşê daristan roj bi roj tê imhekîrin û gelek herêmîn ku bi daristan niha şorax mane.

Liser kaxizan ji 358 gundê Mûşê 93 heb wek gundê daristanî tê xuyakîrin. Lê di esasê xwe de li gelekan ji wan daristan nemaye. Dewleta Tirk li cihîn ku jê tê bi destê xwe, li derêni ku jê nayê bi gundiyyen ku qedr û qîmeta daristanen xwe nizanîn tahrîb dike û dide kirin.

Li gora qeydîn resmî berê çar aliye Mûşê bi daristan bû.

## Jiyana xwe bi dawî anî

PK - Li navçeya Mûtîki di 3ê mehê de ciwanekî bi destê xwe dawî li jiyana xwe anî. Li gundê Evler xortekî 17 sali Erhan Yaşar ji ber sedem eşkere nebû gulek bera sînga xwe da û xwe kuşt.

Piştî teqînê malbata Yaşar reviyan odê lê lawê xwe miri ditin.

## Baranê Dîgor felç kîr



PK - Di 8ê mehê de navçeya Qersê Dîgor di bin baranê de ma. Barana ku wek ji satilê vala bibe bariya û piştî demekê lehî rakir. Jiber ku cemê Dîgorê rabû gelek dikan û mal di bin avê de man.

Li Kurdistanê di van salên dawî de avhewa (iklim) bi awayekî berbiçav diguhere. Di kelkelâ germa havînê de barana zivîstanê zû bi zû nayê ditin dibare, lehî radibe.

Baranê vê carê ji li Dîgorê xist. Barana ku car bi car bû zîpik zirarek mezin da çandiniyê û çendek dewar jî kuşt. Piştî rawestandina baranê xelkê û esnafan rahiştin melkisîn xwe û li bajêr û malen xwe paqîjî kir.

## Panorama

Dilbixwîn Dara



## Pêwîstî bi Ajanseke Nûçeyan heye

**B**i dehan malper, rojname û kovarêne hene. Eger ku em wan bihesibinin wê hejmareke wiha derkeve pêsiya me ku, me qet texmin nekiribe.

Kurd gaveke nû û mezin di warê ragihandinê de davêjin. Gavavêtineke wiha hêviyeke mezin dide mirov, ku di pêşerojê de nîşekî rewşenibr, zana û têgihiştî biafire.

Ragihandin roleke mezin di perwerdekirina civakê de dileze, bi taybeti jî dema ku ew di desten şareza û pisporan de be.

Rojname, kovar, radio, televizyon û malperên kurdi gelik in, her yek ji wan ji aliye xwe ve li gora derfetên di dest de û têgihiştina xwe karekî dike.

Lê belê tiştek ji wan kêm e. Ajanseke Nûçeyan.

Herçiqas em xwediyê gelek navgînên medyayê bin jî, lê heya niha em nebûne xwediyê çavkaniyeke nûçeyan ya serbixwe.

Hebûna ajanseke nûçeyan hem di warê netewî de hem ji di warê navnetewî de giring e. Hün dibînin çavkaniyên me yan rojname û televizyonen tirkî ne yan ji yên erebi ne.

Jixwe gelek caran tişteñ ku di rojname û malperên me de têne weşandin, tenê kopyayeke kurdi ye ji nûçeyen ku di rojnameyên erebi û tirkî de hatine weşandin.

Ajansên hemû miletan hene. Civakên ku bûne xwediyê pêşerojeke demokratik, hemdem û pêşketî berî niha bi sedsalan ajans ava kirine, binêrin di Ajansa frensi AFP de nêzîkî 2000 kes ji 81 neteweyan, 900 ji wan li derveyî Frensa dixebeitin, ew di sala 1832 de hatiye danîn.

Reuters di 1851 de ji aliye Paul Julius Reuter ve li Londonê hatiye avakirin, ev tenê du nimûne ne, bi sedan nimûneyen wiha hene. Wan bi derfetên pir hindik dest pêkirin, lê niha dikarin bi mêzîna siyaseta cihanê bilizin. Her wiha ew ji bo neteweyen xwe ji bûne qezenceke mezin.

Raste du-sê ajansên me ji hene, lê ew yên rëexistinan in, ew ajans nikarin roleke mezin bilizin û bibin pirek di navbera Kurdistanê û cihanê de, ew hem teng dimînîn hem ji ji aliye medyaya cihanî ve pir cidi nayê girtin. Ewqas bûyer li Kurdistanê qewimin, niha ji diqewimin, ka kijan ajanseke cihanî nûçeyeye ajans yan ji rojname û televizyonike me weke çavkani nişan daye? Tune ne.

Tiştekî balkêş e, bûyereke ku li Hewlêrê yan ji li Silêmanî diqewime, yan em ji rojnameya Al Şarq Al Awsat a erebi yan ji ji Hurriyetta tirkî digirin.

Em wan weke çavkani nişan didin. Li cem me diqewime, lê em diçin ji Ankara yan ji ji Londonê digirin. Em dibêjîn: "Li gora CNN-TURK li Diyarbekirê di filan rojê de filan tiş pêk hatiye..." teví ku em bi xwe li Diyarbekirê ne ji. Di rewseke wiha de wê tu caran nûçeyen ku em bi xwe amade dîkin ji, ji weşanên din re ne cihe baweriyê bin.

Cî bibêjim ajansên me, bi nûçeyen ajansên din ajans in, peyamnîrên me yan tune ne, yan ji gelekî kêm in. Peyamnîr ji MHA digire, MHA ji DIHA, DIHA ji AA (Anadolu Ajansi), yan ji ji peyamnîrekî ku wî bi xwe ji ew nûce ji Milliyetê girtibe.

Yan ji O. Politika ji MHA digire, MHA ew ji DIHA, DIHA ji ew ji Hurriyet ê û Hurriyet ê ji DPA girtiye.

Rewş gihaye radeyeke wiha ku bawerîya me bixwe bi nûçeyen ku medyaya me diweşîne neyê, em radibin ji cihîn din digirin, bawerîya me bêhtir bi rojname û ajansên cîranan té.

Her roj kanalên televizyonê yên nû vedibin, her roj rojname û kovarêne nû dest bi weşanê dikin, hemû ji hema hema kopyayêne hev in, bi mîlyonan dolar li wan têne mesrefkirin, lê mixabin kesek li avakirina ajanseke nafikire. Bi hezaran kes di wan rojname û televizyonan de dixebeitin, lê ka yên ku rabin û bibêjîn em ajanseke ava bikin û 20-30 peyamnîr û rojnamevanan têde bixebeitin û nûce, raport, wêne û hevpeyînan bi ser wan rojname û televizyonen xwe de bibarin!



Nejdet Buldan

## Barîkella Tanju!!!

**M**in fitbol û gelek sîporêni dî divêni. Di zarakatîye de taximê min yê fitbolê Beşiktaş bû. Piştî min xwe farnandi, ez û taximên Tirkan ji yêk dûr keftin. Xeta bit an ne, min Tirk bi sîporê ji nevîn. Niha fanatîkek Barselona û Real Madrid im. Lê hemû sîporan temâse dikem, nemaze fitbola Liga Şampiyonan, Cihane û ya Elman, İtali û Ispanyolan. Xurtîniya xwe min xişkê(ski, qayax) ji dikir. Lê, niha tenê temâsevanîya televîzyonê min pê çedîbit.

Tê bira min, serokê Parlamentoya Katalanya, digote me 'gelo hûn Kurd nikarin taximeke fitbolê çeken û navê Kurdan li dînyayê di wî warî da ji derêxin? Binêrin taximê Barselona faktoreke gelek mezîn e. Rebeno, şert û mercen Tirkîye û yên me Kurdan baş ne dizanî.

Min bihist ku rîvebirek Kurdistanê Federe, an ji yêki liser navê wan tekliji Tanju Çolak kiriye. Jibo antirenoriya taxima/taximek Kurdistanê.

Di çapemeniya Tirkan da, liser vê mijarê gotinê Tanjû eve bûn: "...Raste, Münir Ceylan ji bakurê Iraqê bi telefonê li min geriya. Ew teklife li min kir. Ez li Tirkîye leyîztkerek gelek baş bûm, belê piştî min fitbol hêlay, ci taximên me (Tirkan) qedrê min nezanîn. Niha ew teklife gelek baş e û pêwîstîya min ji pê heye. Belê, hestê min yên neteweyî nahêlin ez li Bakurê Iraqê vî kari bikem....." (Çavkanî: HYPERLINK <http://www.Superonline.com.tr> 6 ê Tebaxê 2005)

Birastî ez nizanim ka gelo Tanju dê bibe antirenorê 'Kurdistansipor'ê an ne. Ya ez dizanim em bakurî tenê evîndarêni Tirkan nînin. Ma em mecbûrin jibo futbolê ji Tirkan bo xwe bikeyne minak. Ew dikarin bêjin Tirabzonsipor, Adana-demirsipor, Kayserisipor û û. Taximên me ji bila navê wê Kurdistan, Hewlêr, Duhok û nizanim çi bît. Ew 'sîpor' çiye gelo?

Belê ya herî balkêş daxuyanîya Tanju ye.

"Niha ew teklife gelek baş e û pêwîstîya min ji pê heye. Belê, hestê min yên neteweyî nahêlin ez li Bakurê Iraqê vî kari bikem"

Tanjû leyîztkerek baş bû. Di taximê Tirkan yê neteweyî da ji gelek serkefti bû. Heke ez xelet ne-bim, salekê ji yê herî gelek gol haveti ew bû. Navê wî li gel Hûlya Avşar ji belav bû. Paşê bi têkeliya maftya kû bi sexteyî erebeyek kiri bu, hate girtin filan û bêvan.

Jibo min ya pêwîst ew helwesta wî ya "hestê neteweyî" ye. Li "bakurê Iraqê", jiber kû hindek kes dibêjinê Kurdistan, ew hestê wî yên Tirkî nahêlin bixebe.

Hizar car barikella Tanju! Heke me ji, eqilek ji 950 salêni bav û bapîrêni te girtiba me ew tekliji te nedikir. Ma li dînyayê yê fitbolê dizanîn tenê Tirkîn?


Çawa Nelson Mandella xelata Tirkan ya binavê Ataturk red kir û dersek baş da Tirkan, Tanju ji dersek wesa da Kurdan. Bila mijar cuda be, wateya helweste cuda be ji.

Sed caran barikella Tanju, seeta te xwes!!!

Ez hîvidarim tu birçî ji bimîni lê vê teklife gebûl neke.

Da ku em ji bizarin do (dew) ji mast çedîbit.

## ,Amerîka û Ewropa jibo desttêwerdana Îranê ne amadene'



PK - Çalakiyên nukleeri yê Iranê di çapemeniya rojava de cîheki taybetî digire û şiroveyen cûrbicûr tên kîrin.

Di vê mijarê de niqteya hevbes ewe ku Amerîka û Ewropa jibo krizek bi Iranê re ne amadene.

Biryara Iranê ya domkirina dewlemendkirina úranyûmê ji aliyê rojnameya Almanî Frankfurter Allgemeine ve bi darbeyek li himber Ewropa hat binavkirin. Şiroveya rojnameyê weha ye: "Iran bawer naake ku Konseya ewlekariye li himber wê ambargo deyne. Ger tiştekî weha bibe Iran dikare tehdîda tevlihevkirina Iraqê û Rojhilata navin bike."

Rojnameya Britanî The Daily Telegraph idia dike ku Iran fortan li Amerîka û ewrûpa dike û di pêwendiyê navnetewi de nexweşîya çedike. The Guardian radîgihîne ku ev biryara Iranê riska mudaxalekirina Amerîkayê zêde dike.

Li gora rojnameya Almanî Su-eddeutsche Zeitung divê tirs neyê mezinkirin û weha didomîne:

"Jiber ku Iranê li Isfahanê ji nûve dest bi çalakiyên nukleeri kir şerî dînyê yê sêyem dernakeve." Li gora rojnameyê ger ambargoylek petrolê bê danîn wê canê Iranê bişewite lê di demek ku pêşkêsiya petrolê kêmbyûye û buhayiya petrolê zêde dibe ne mumkine ku welatên rojava seri li rîyek weha bidin."

Rojnameya Fransî idia dike ku kriza bi Iranê re Amerîka û Ewropa nêzîkî hevdu dike û didomîne: "Bi kriza xwe ya bi Iranê re Washington bi awayekî dîqat Ewropa û şerî Iraqê disopîne. Krîza bi Iranê re Amerîka û Ewropa nêzîkî hevdu dike. Hilbijartina serokkomarê radikal dubendiyê herdu aliyan okyanusa Atlasê avêt plana duyem."


## Iranê derbeya tâlî ji Rûsyâ xwar

PK - Di xebatên xwe yên nukleeri de Iranê derbeyek ji ji dostê xwe yê dawî Rûsyayê xwar û bi tenê ma. Amerîka û Ewropa bi dijwarî li himber Iranê radiwestin, lê Rûsyâ piştgiriya Iranê dikir.

Di 9ê mehê de Rûsyâ ji Iranê daxwaz kir ku dawî li çalakiyên nukleeri bîne.

Wezareta karê hundurîn ya Rûsyayê bi daxuyaniyek ji Iranê xwest ku derhal çalakiyên xwe yên veguherandina úranyûmê rawestîne û bi Saziya enerjiya atomî ya navnetewi re hevkariye bidomîne.

Hefteya bîhûrî ligel biryara ji nûve destpêkirina dewlemendkirina úranyûmê Rûsyayê eşkere kiribû



ku piştgiriya programa nukleeri ya Iranê dike.

## Îmamê Ereb ê Sûrî ji Londonê reviya

PK - Hat ragihandin ku Îmamê Erebê Sûrî Şêx Emer Behri Mihemed jiber ku methê êrisen teroristi li Londonê kir ji Britaniya reviya û çû welateki Rojhilata navin.

Jiber ku Şêx Emerê Sûrî 4 teroristên ku li Londonê êriskarî lidarxistibûn bi "4 kesen muhteşem" binavkiribû, bi sûcê "xayıntiya welêt" girtin û dari-zandina wî hatibû rojevê.

Şêx Emer weha gotibû: "Ew çar kesen ku êriskariya Londonê lidarxistin muhteşem in. Ger min êriskar naskiribûya minê piştgiri bîdaya wan û min ew nedida polîs."

## Gelo demokrasî li Brîtaniya dibe qurbanî teroristan?



PK - Rêxistina şopandina mafen mirovan (HRW) ragihank ku tedbirêni ku li dijî terorizmê tên pêşniyarkirin jibo azadiyan bi telûke ne.

HRW di 10ê mehê de li Londonê bi daxuyaniyek nivîski eşkere kir ku, "Hin pêşniyaren ku nuha liser wan nîqaş tên kîrin, di warê mafen mirovan de bi mukelefîyetâ Brîtaniya re li hevdu nakin û bi nakoki ne. Hin tedbirêni li dijî terorizmê tên pêşniyarkirin di warê azadiyan olibû ifadekirine de bi tehlûke ne."

Di daxuyaniya xwe de HRW diyar dike ku ji Brîtaniya derxistina keseki ku karibe li welatê xwe êşkence bibîne ihlalkirina yasayen Brîtaniya û hiqûqa navnetewi ye.

Serokwezir Tony Blair di axaftinek xwe ya 8ê mehê de gotibû ku wê derxistina kesen ku methê şidetê dîkin hêsanter bikin.

# Sehneyek ji “Lîstika Mezin” (2)

Ahmed Zeki Okçuoğlu

Ji mêt ve ye di nav Rojavayıyan de, di derbarê Tirkan de ya yekê neyinî ya din jî erêni du nihêrin hene. Nihêrina menfi ya çandî ye, bingehê xwe ji dirokê werdigire. Ya din realpolitik e, bingeha xwe ji nakokiyen navnetewi (jeopolitik) werdigre. Pişti Şerê Cihanê yê I. Rojavayı dema ku liser pirsgirêka imparatoriya Osmaniyan mijûl dibûn jî ev herdû nihêrin di rewacê de bûn. Peymana Sewrê nihêrina yekê, peymana Lozanê jî nihêrina didoyan temsil dike. Lê wek me di nivisara xwe ya beriya hefteyekê de jî qal kiribû. İngilizan Sewr ne jibo bicihanîna vê nihêrinê, lê jibo biserxistina projeya Mustafa Kemal anîbûn holê. Bi gotineke din İngilizan jibo berjewendîya xwe ya kolonyalî Sewr bikar anîbûn. Pişti pêkanîna vê projê jî dev ji Sewrê berdan. Destxetkirina Mondrosê jî nîşana vê yekê ye.

Niha jî em bê ser mijara nivisara xwe ya vê hefteyê; liser pêwendîya Sewr û Kurdan...

Di nav Rojavayıyan de di derbarê Kurdan de berevaji Tirkan, tim bitenê nêrinek hebûye, ew jî jeopolitik e, lê ne weki Tirkan erêni ye. Ya balkêş jî di jeopoliti-kayê de berjewendiyen Kurdan û Tirkan tim li diji hev bûye; jiber ku di nav dused salêni dawî de jeopolitik berjewendîya Rojavayıyan û ya Tirkan tim da cem hev. Ji bo vê yêkê jî jeopolitik di heman demê de Kurd tu car di nav hesabêni Rojavayıyan de cîhekî muspet negirtine. Di dawiya Şerê Cihanê yê I. de Wek Paul C. Helmreich jî dibêje di destpêkê de di projeya İngilizan de avakirina dewletên Filistin, Sûri, Mezopotamiya (Iraq) û Erebistan hebûn. Kurdistan piştre ket nav hesaban. Sedem jî başûrê Kurdistanê bû.

Kaniyên petrolê yên başûrê Kurdistanê jibo ekonomiya İngilizan ne yê jê-gerinê bûn. Dixwest wan bi dest bixîne. Rêvebiriya Tirkan jî li hemberî vê daxwaza İngilizan li berxwe didan lê ew erd ya Kurdan bû û liser erda Kurdistanê bi navê Tirkan meşrûiyeta desthilatdariya Tirkan tune bû. Tirk jibo ku meşrûiyeta desthilatdariya van erdan bidest bixînin teoriya hevbesiya Tirk û Kurdan lihev anîn. Ligor vê teoriya lihevhatî digotin Kurd û Tirk ji kûraniya dirokê û virve hevbesen hev in, ji hev keç girti ne û dane, pişti hatina İslâmî ola wan jî bûye yek. Ji bo ku vê hevbesiyê têxin nav formekî siyasi, Misak-i Millî derxistin. Li gor Misak-i Millî di navbera Kurd û Tirkan de tu cûdahî tunebû, pişti rizgarîye wê dewletek hevbes li ser erdê Kurd û Tirkan bihata ava kirin û wê di wê dewletê de Tirk û Kurd xwedanê heman mafan bûna. Ji bo ku Kurdan bixapînîn, ji aliye rêvebiriya Tirkan ve bi serê xwe bikaranîna navê Tirk hatibû qedexekirin. Kengî navê Tirk bianîna ser zimanê xwe, bêguman digel wî navê Kurd jî dianîn ser zimanê xwe. Ji ber ku li diji İngilizan liser iştimala cengekê radiwestîyan, İttihadiyan qedrê Kurdan digirtin. Pişti ketina Yew-naniyan li Egeyê carek din eşkere bûbu ku bi misilmanen Egeyê û Anatoliyayê û dora Behra Reş (jere dihate gotin Tirk)



Serîf Paşa, xwest ser navê Kurdan beşdarî Konferansa Sewrê be.

re li dişî İngilizan û hevbesen wan projeyê kirina cengê xelet bû. İttihadiyan geleki baş famkiribûn ku bi İngilizan re bê piştgiriya Kurdan şer çenedibû. Ji ber ku İttihadiyan ev yek baş dizanibûn hêzên xwe xistibûn Kurdistanê û jibo kû baweriya Kurdan bi wan bê, parastina neteweparêziya Kurdan dikirin (Wadie Jwaideh, Kürt Milliyetçiliğinin tarihi – Kökenleri ve gelişimi, İletişim Yayınları).

Vê helwestê İngiliz bêgav hişt ku hesabê Kurdan bikin. Ew jî li diji Misak-i Millî bi Sewrê bi Kurdistanek serbixwe derketin. Weki me berê jî gotibû pişti serketina proja Mustafa Kemal, İttihadi û Seray derveyî çerxa siyasetê man û Tir-

kan Misak-i Millîya xwe şûnve kişandin, İngilizan jî Sewra xwe... û weki me berê gotibû li ser Mondrosa didoyan (Lozan) lihev kirin.

Dewletbûna Kurdan bihata pejirandin jî Kurdistanâku di Sewrê de dihate binavkirin, rê nedida Kurdistanek biaram û jiyandirê. Beriya Sewrê Kurdistan sê parce bû, Kurdistanâku Osmanî, Kurdistanâ Iranî û Kurdistanâ Rûsyayê. Bi peymana Sewrê Kurdistan di destpêkê de hatibû sêperce kirin. Perçê mezin didan Ermeniyan. Perçê didoyan didan Iraqa ku mandaya İngilizan bû, perçeyê sisîyan jî ji Tirkan re dihiştin. Perçeyê ku didan Tirkan jî dihate duperce kirin, perçeyek

weki erdê Tirkan bi dest wan ve dihate berdan; li ser perçê didoyan jî Kurdistanek otonom dihate avakirin. Heke pişti salekê gelê Kurdistanek otonom bi referandumkê doza Kurdistanek serbixwe bikirana, wê çaxê wê perçeyê dibin desthilatdariya İngilizan de ji bidana bin desthilatdariya vê dewletê.

Wek lijor jî me gotibû, Kurdistanâku di Sewrê de dihate binavkirin, bêpêşeroj bû. Kurdistanâku Sewrê ji aliye Tirk, Ereb, Faris û Ermenan ve hatibû dorpêç kirin. Jiber ku gelek erdê Kurdan di destê wande bû, ew hemi bi Kurdan re di nav nakkoyî de bûn û li aliye din jî çavêwan li erdê Kurdan bû. Ji ber vê jî tucaran rê nedidan ku Kurdistanek serbixwe bijî.

Lê Sewr liser kîjan hesaban hatibe çekirin bila bê çekirin û dûre nehatibe neritîn (tatbikkirin) jî, dagirkeren Kurdistanê, bi piranî ji Tirkan ditirsîne. Kengî qala Kurdan û Kurdistanê bê kirin, Tirk ji nîşka ve bi sendroma Sewrâ dikevin û tore dibin. Di vê yekê de Tirk ne neheqin jî. Bivê nevê Sewr peymanek navnetewi ye û tê de hebûna Kurdan û mafê avakirina dewletek serbixwe ji bo wan hatiye pejirandin. Ji ber vê yekê jî ew di destê neteweparêziya Kurdan de bû pelgelyek bingehîn.

Ji aliye din ve Sewr jibo neteweparêziya Kurdan bû bingehêk jixwebawerîyê. Pişti Lozanê Tirk jibo tunekirina Kurdan kampanyayek gelek mezin lidar xistin. Di propagandayê xwe de digotin bi navê Kurd neteweyek tune ye. Li aliye din jî digotin, Kurd nabin dewlet. Neteweparêziya Kurdan li diji van gotinan derdiketin û digotin, hebûn û mafê dewletbûna Kurdan bi pelgelyeke navnetewi ku hûn jî têde ne hatiye pejirandin.

Li cihê Sewrâ Lozan hatibû pejirandin lê Tirk hê jî ji Sewrâ ditirsîyan. Du sedêmê vê tîrsê hebûn: Ya yekê ew bû ku bi biryareke navnetewi mafê dewletbûna Kurdan hatibû pejirandin; ya didoyan li ciyê wê Lozan xistibûn rewacê, lê dema ku ev kar hatibû kirin Sewr nehatibû betal kirin. Ev herdu dibûn sedama tîrsa dilê Tirkan. Ji ber vê yekê jî digotin “Wê Rojavayı rojekê Sewrê carek din bînin rojevê”.

Gotina “Wê Rojavayı rojekê Sewrê carek din bînin rojevê”, bi tenê nedibû sedema tîrsa dilê Tirkan û dagirkeren din; dibû hêvîdariya neteweparêziya Kurdan jî. Haya Tirkan jê tune bû lê bi vê gotinê av dibirin ser aşê Kurdan, wan jî digot rastiyek di vê de heye ku Tirk her roj dibêjin “wê rojekê Sewr têkeve rojevê”.

Dirokê tîrsa Tirkan piştrast kir. Careke din leşkeren Rojavayıyan ketin Rojhîlata Navîn. Lê vêcarê ne di Çeneqqeleyê re, ew di Besrayê re ketin hundir. Ya xirabitirin jî ewe ku içar serê Rojavayıyan ne İngilîzen dahênerê (mucîd) Sewrê, lê Emeriki dikişinîn.

Wek neteweparêzekî Kurd, ez him ji vê rewşê kîfxweş im û him jî tîrsenak im.

Dilê min kîfxweş e, jiber ku ji niha ve bingehê Kurdistanê li başûr hatiye avêtin. Dilê min tîrsenak e, jiber ku dijminen Kurdistan bi ruşwetan û dek û dolaban dixwazin vê avahîye xera bikin; heke ev ji wan neyê dixwazin qet nebe ev avahî bi xwe ve sinorkirî bimîne.

**biravetî**

Bayram Ayaz



## Tifaqa herêmî ya dijî Kurdan dixwaze destkeftiyên li basûr pûç bike

**V**ê fetrê li Iraqê û Kurdistanê muneqeseyên derbarê de stûra herdemî bûye mijara sereke. Heta radeyekê mirov dikare bêje bala hemi hêzên Rojhilata navin liser vê pirsê ye. Béguman Emerika ji bi her awayî di nav vê pirsê de ye. Ev kar nuha di navbeyna hêzên Kurdistanî û hin hêzên Ereb de bi rengê şerekî berdewame. Sedema vi şeri doza Kurdistanê ye. Di Komisyona amadekirina destûrê de Kurd û Ereb liser pirsên bingehin nikarin lihevbikin. Piraniya Ereban daxwazên Kurd û Kurdistanîyan qebûl nakin. Bi taybetî şayê olperest ku piraniye teşkil dikan, dixwazin di Iraqa nû de rejimekî ligor bir û hîzrên xwe olt û njadî (rejimek meleyen Ereb) damezirinin. Hêzên Kurdistanî di muneqeseyên destûrê de bi duali têkoşînê didin.

Ew dixwazin ji aliyekî ve daxwazén gelê Kurdistanê di destûra nû de bicibikin, ji aliyê di ve ji berevaniya bir û hîzrên mirovane û demokrat dikan. Jibo çareseriya doza Kurd û Kurdistanê mixabin ci sia ci sunî piraniya Ereban xwedî helwestek şovenist in. Ew di pirsên olt û parvekîrina desthilatdariyê de lihev nakin, şerî hevdî dikan. Lî dema mijar dibe doza Kurdistanê pirsên navxweyi didin aliyekî û li hemberi Kurdan helwesten hevbes wurdigrin.

Nelihevî û aloziyên derbarê pirsa destûrê de pirsên zahîf giring in. Dahatuya du netewên sereke Kurd û Ereban û minoriteyên wek Aşûri, Keldanî û Tirkmenan li Iraqê û Kurdistanê bi vê destûrê ve girêdayî ye. Destûr li welateki ferehnetewi, fereholi, ferehkulturi û pirrzimanîpeyman û belgenameya sereke ya şirikatiya gelan e. Maf û erk û desthilatdariyên neteweyan û her cure minoriteyên di vê belgenameyê de têni diyarkirin. Pirsên ku di duwarojê de rûbidin, pêwiste ligor destûrê, ligor vê lihevhatînê çareser bibin.

Ereb dixwazin dewleta nû ji bibe dewletek netewiya Ereb û Iraq parçeyek ji alema Ereban bê cesibandin. Yanî ligor hewldanen Ereban bi taybetî nîta şayê olperest ew e ku ew bibin baasiyên nû yê Iraqê û li nav sinorê fermî dewleta Iraqê yanî liser axa Erdoganê û li Kurdistanê seranser bibin xwedî desthilatê. Ereb carek dî dixwazin bibin melik û serwerê Kurd û Kurdistanê. Ev net û hewldanen Ereban dubare dagîrkirina Kurdistanê ye.

Ev aloziyên iro rûdane, pirsek ne tenê navbeyna hêzên Kurdistanâ basûr û Erebanen Iraqê de ye. Li pişt perdeye hin dewleten herêmî hene. Tirkîye ji di van leyiztikan de rolek nebaş dilize, belki rola herî nebaş! Tirsa hin dewlet û hêzên Ereb tirsa demokratizekirina Rojhilata navin e. Ew ditirsin desthilat û seltenata wan a saman û dewlemendiya petrolê ji destê wan derbiye. Tirkîye û dewleten dî ku Kurdistan di nabeyna xwe de dabeşkirine, ligel tirsa demokrasiye tirsa wan ya sereke kêşeya Kurdistanê ye. Eger di destûra Iraqê de dewleta Kurdistanê statûyek fermî navdewli bidest bixe, ev dikare bibe nimûne û wê tesira xwe liser parçeyen di ji bike. Ew hewl didin van destkeftiyan pûç bikin, dewleta nuha ya defacto 'serbixwe' birûxînin. Ev net di itîrazen Ereban de qenc xuya dike.

Daxwazên hêzên Kurdistanî sereke ev in:

1. Diyarkirina sinor û nexşeya Kurdistanê
  2. Tarifa dewleta Iraqê ku ew ji du netewe (Ereb û Kurd) û minoriteyan û ji du welatan (Kurdistan û Erdogan) pêktê.
  3. Zimanen fermî yê dewletê divê Erebi û Kurdi be, ku hemi belgenameyen dewletê pêwiste bi du zimanen be, wek nimûne liser pareyê Iraqê bi Kurdi û Erebi binivîse.
  4. Hêzê pêşmerge bimîne û wek hêzek leşkerî yê Kurdistanê bibe parçeyek ji artêşa Iraqê
  5. Di derbarê Kerkükê de madeya 58 cibecih bibe û Kerkük û hemi deveren nû ku rizgarbûne bi Kurdistanê ve bêne giredan.
  6. Kurdistan bikare li derive ji temsila xwe bike. Ev û hin daxwazên di wê dahatuya basûrê welatê me diyar bike, heta çarenuya hemi Kurdan û Kurdistanê.
- Divê çav û guhêne me li ser Kurdistanâ azad be.

# Kurd û Şî: Kawayê Hesinkar û Mehdî Muntezer



Xanîmekê Kurd: Kejal Phmed

## Nizar Caf


**H**emû navendên siyasi yêlî deverê û cihanê, bi awayekî vekirî behsa têkçûna asoya ku Kurd û Şî lê bigihîjin armancekê dikan. Daxuyanîyen tûnd yêlî ku vê dawiyê ji aliyê Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî ve hatin kirin, weke nameyeke vekirî bûn. Ev name ne bi tenê ji bo aliyen siyasi yêlî Şî bû. Ew ji bo herkesê ku ci dûr û ci nêzîk têkiliya wan bi guherandin û listika siyasi ya Iraqê re heye, peyamek bû. Guman têde tune ye ku daxuyanîyen Barzanî, li beramberi manevrayen siyasi yêlî Ceferî û Hekîm nerazibûneke rastexo bûn.

Di rastiyê de, nerîna ku dibêje, li ser pirsa Kurdan ditinê cuda di navbera derdora Şî de hene, ne raste. Ev nerîna xwexapandin, kurtbinî û dîtineke şase li ser boçuna rêberen Şî ya di derbarê Kurdan de. Ji bo wan kesen ku dibêjin, baweriya rêberen Şî bi doza Kurdan heye, baştîn bersiv nerazibûna Komara İslamiya Iranê ya li beramberi bizava Kurdistanê rojhîlat e. Ev yek bi şeveyeke vekirî nerîna Şîyan ya li beramberi mafêne Kurdan yêlî netewi diyar dike. Di derbarê mafêne netewa Kurd de, wek prensib û fikir tu cudabûn di navbera nerîna İslamiyên Şî û yêlî Sunnî de tune ye. Wek nimûne, partiya AKP ya Tirkîye û partiyen İslami yêlî welatên Erdogan, di vê derbarê de weke Partiya El Dawe, Encümena Bilind ya Şoreşa İslami, Eli Sistanî û Muqteda El Sedir difi-

Civîna vê dawiyê ya herdû partiyen desthilatdarê Kurd li Pîrmam, yekhelwestiya Kurdan ya di derbarê pirsgirêkîni niha û pêşeroja Iraqê de ji diyar kir. Ev yekhelwestiya Kurdan, li beramberi temamê erîşan bû bersiva herî baş. Bandora vê yekê li parçeyen din yê Kurdistanê ji dice.

Ceferî û hemû aliyen din yêlî Şî, serê xwe li ser wê yekê diêşinîn ku ew riya prosesa mezhebi û siyasi ji xwe re vekin. Lî bi ci awayî dibe bela bibe, ew dixwazin Kurdan bixapînin, ji bo ku ew di vê qonaxa dîrokî de têkevin bin bandora dek û dolabên wan. Li beramber prosesa mezhebi ya Şîyên Iraqê ku di rastiyê de beşek ji prosesa Şîyên Iranê ye, Kurd ji xwediye progamekî şaristanî û demokratik in. Tişte ku Ceferî û hemû aliyen Şî bi dudili lê temaşe dikan ji ev programe.


Ezmûna Parleman û Hikûmeta Herêma Kurdistanê, pişti ezmûna Israîl diyartirin nimûneya demokrasî û şaristaniyê ye. Hêzên dijber hewl didin ku bandora vê ezmûnê ya li ser beşen din yêlî Kurdistanê, asteng bikin, lê belê hêza wan têrê nakek ku ew vê bandorê lawaz bikin. Hikûmeta Herêmê, welatên kombûnen seâlî (Tirkîye, Sûriyê û Iran) neçar kirin ku ew li gel wan danûstendinê siyasi û bazirganî bikin. Gelê Kurd, ji bo welatên İslâmî selimand ku baweriya wî bi prensibîn ola İslâmî heye, lê belê ew ne di wê baweriye de ye ku ola İslâmî riya avakirina dewletê bide Faris, Ereb û Tirkân û vî mafî ji destê Kurdan bigre.



Xanîmekê Şî

# Kerîm Sincarî da ser şopa Mac Carty

Sernivîserê  
rojnamê  
Ako Gerdî



Wezareta Karûbarê Hundir ya Kurdistanê, ji ber rapirsiyeke (anket) ku di rojnameya MEDYA hejmara 2001 de belav bû, sernivîserê rojnamê Ako Gerdî û berpirsê Peymangeha Kurdistanê bo Pirsên Siyasi Mûsa Ehmed dan girtin.

Rojnameya Medya û Peymangeha Kurdistanê bo Pirsên Siyasi, xwestin rapirsiyekê di derbarê karûbarê 3 mehîn dawî yên hikûmeten Hewlîr û Silêmaniye de bikin û encamên wê di rojnameyê de biweşinin. Li gora gotina sernivîserê rojnameya MEDYA Ako Gerdî, 1500 hemwelatî besdarî vê rapirsiyê bûne. Di encama rapirsiyê de diyar bûye ku li Silêmaniye baştîrin wezaret, Wezareta Karûbarê Hundir e, lê belê li Hewlîr Wezareta Hundir weke xirabtîrin wezaret hatiye dîtin. Li Dihokê weke baştîrin wezaret, Wezareta Awadankirinê û xerabtîrin wezaret ji Wezareta Ewqaf (karûbarê oli) hatiye destnîsankirin.

Piştî ku encamên vê rapirsiyê de rojnameya MEDYA de hatin belav kirin, Wezirê Karûbarê Hundirin Kerîm Sincarî bîryara girtina sernivîserê rojnamê Ako Gerdî û berpirsê Peymangeha Kurdistan Mûsa Ehmed bi dadgîran da derxistin û her wiha fermaña lêgerîna mala Ako Gerdî ji hat dayîn.

Herdû rojnamevan ji aliye polisan ve hatin lêpirsin û bîryara girtina wan hat wergirtin. Tişte herî balkêş li gora Ako Gerdî ewe ku, bîryara girtina wan li gora Yasaya Ceza ya İraqê, xala 433 hatiye wergirtin ku yasa bixwe ya dema desthilata Saddam Hisêne. Ako Gerdî dide zanîn ku piştî bîryara girtinê, xwestine wan bibin zîndaneke ku qatil, zinêkar û diz tê de dimînin, lê belê ew di encam de bi kefaletê hatine berdan.

Wezareta Hundir û Kerîm Sincarî di vê bûyerê de temamê mafêñ azadiya çapemeniyê bi awayekî vekirî binpê kirine. Li tu welateki pêşketî, mafê çêkirina rapirsiyê nayê binpêkirin, bi tenê li welatê ku qîmetâ nerîna rayagîstî tunebe ev mafji destê xelkê tê wergirtin ku ew nikaribin nerînen xwe diyar bikin. Wezirê Hundirin

yê Kurdistanê Kerîm Sincarî bi vê helwesta xwe, mafê derbirina nerîna civakê binpê kirîye û ji bo vê yekê ji yasayê dema diktatoriya Seddam (xala 433 ji yasaya ku di sala 1969an de derketiye) bikar anîne. Li welatê ku rîza wan ji bo azadiya çapemeniyê heye, pirsgirêkîn wiha bi awayekî medenî bêyî ku destê polisan têkeve nav têne çareser kirin. Doz li xwedî û sernivîser yan ji nivîskarêñ rojnameyan têne vekirin, lê belê ne ji bo ku wan karê xwe pêk anîye û nerîna raya giştî ya di derbarê hikûmetê de belav kirîye. Heger di nûçê, nivîs an gotarekê de destdirêjiya mafêñ kesekî hebe, ango kesayeta wî tê de were biçûkkirin û heqaret kirin, mafê wî kesî heye li dijî nivîskarê wê nivîsar, gotar û nûçeyê dozê veke. Lê di rapirsiya rojnameya MEDYA de, tu êrîş û heqaret ji bo kesayeta Kerîm Sincarî bixwe nebûne ku ew mafê girtina rojnamevanan bide xwe. Kesêñ ku gotine Wezareta Navxweyî ne baş e, hemweliyên Kurdistanê bixwe ne, wê demê divê Kerîm Sincarî bi yasayeke ji yasayê dema rejîma Bees, xelkê ku besdarî rapirsiyê bûne ji bide girtin.

Wezirê Navxweyî, di vê bûyerê de yasayê Sendikaya Rojnamevanen Kurdistanê ji binpê kirine. Wî di derbarê endam û birêvebirekî wan de (Ako Gerdî endamê Encûmena Sendikaya Rojnamevana ye) bêyî ku wan agahdar bike, bîryara girtinê derxistiye. Li gor yasaya Sendikaya Rojnamevanen Kurdistanê, nabe ku bêyî xebera wan di derbarê yek endamê wan de lêpirsin çêbibe. Lê di vê bûyerê de, lêpirsin ji li aliyeke, bîryara girtinê hatiye derxistin û rojnamevan weke tawanbarê adlı hatîne dîtin.

Pêwîste were gotin ku Sendikaya Rojnamevanen Kurdistanê û temamê endamê çapemeni û ragihandina Kurdistanê, di van herdû bûyerê dawî de (girtina KTV û bûyera rojnama MEDYA) bi bêdengiya xwe, nişandane ku ew hîna geleki dûri parastina azadiya çapemeni û ragihandinê ne.

Sekreterê Sendikaya Rojnamevanen Kurdistanê Zîrek Kemal, sedemîn bêdenîgiya sendikayê ji rojnameya me re wiha anîziman, "Yasayêñ me hîna yasayêñ dema rejîma Bees in, em niha hewl didin ku van yasayan biguherin û di warê çapemeni û ragihandinê de ji sînorêñ azadiye berfer-ehtir bikin. Me ev bûyer bi awayekî fermî şermezar nekiriye, ji ber ku endamê desteya birêvebiriyê ne amade ne, ew ji bo karekî çûne Bexdayê, ez bi tenê li Hewlîr me û ez nikarim bi serê xwe belavoka şermezkirinê belav bikim. Lê belê ji bo berdana Ako Gerdî û Mûsa Ehmed, tişte ji destê me hat me kir. Ew hatine berdan. Tişte ku hatiye kirin, destdirêjiyeke ji bo azadiya çapemeniyê û em vê yekê şermezar dîkin. Em hewl didin ku wan yasayan biguherin. Em danûstendinan li gel hikûmetê dîkin û dixwazin mafêñ xwe berfer-ehtir bikin".

Diyare ku hînek birêvebirîn Hikûmeta Kurdistanê, dema ku li hesabê wan were dev davêjin yasayê rejîma Bees, lê dema ku were xwestin û di berjewendiya wan de be ji dest davêjin wan yasayê kevnar û azadiya gotin û kirinê bisînor dîkin.



Baran Hemze

## XEWN Û XEYALÊN RÊXISTINEK XURT LI BAKURÊ KURDISTANÊ

**H**er bi xewn û xeyalan dijîm ku wê rêxistinek xurt çawa bê avakirin an ji wê kengî bê? Bawer dikim kesen mina min gelein û ji xwe dipirsin gelo eme çawa serrast bikin ku ev kula giran û bê derman kirin.. Wê kijan hekim û lokman di hawara me de bê ku me ji vê kula giran xilas bike! Carna dibinim, bi hezaran keç û xorten Kurdan di kolanen Amedê de liser piya diqîrin "bijî Kurdistan bijî Serxwebûn!" Dengê peyamên keç û xorten çeleng bircen Amedê dilerzîne, li her aliyê Amedê serhildane, dilan e.

Hey Xwedêyo ew ci tiştek xweşe ku daxwaza salan pêk tê, bi hezaran kes li ser piya û daxwaza mafê xwe yê rewa dike û diqîre "bijî Kurdistan, bimre Koledari, Bijî Serxwebûn Bimre kedxwarîl" Banga wan jiser bircen Amedê bilind dibe û diherike, gelyê Zilan, Kocgiri, Dersim, Agiri slavê liber dîlana serhildanê digrin. Bilind dibe havara Şêx Seîdê nemir, li Mehabata rengin deng dide havara Şehîd Qazi Mihemed, çar perçê welatême dihejine.

Qêrîna Serokê mezin, Melle Mistefâ "yê nemir zindî dike Pêşmergê Kurdistanê, toximê serwebûnê diçine li Barzan, Mehabet, Amed û heyâ Qamîloka rengin. Kurdistan ber bi serxwebûnê ve dice. Temaşê dikim serkidayetiya Kurdan li Pirmam e lê dengê wî li Amed dibihizim û dibêje "ez amademe jibo Ala Rengin canê xwe fidâ bikim" baweriya cenabê wî dibe baskê teyrê baz û di nav çiya, gelî, çem, günd û bajarê Kurdistanê de digere, kolan bi kolan.

Ma edî liser axa piroz û azad mirin heye! Xewn û xiyalêñ min wek çiyayê Agiri xurt dibe. Berf û baran tucar jê kêm nabe lê tucar ji çiyayê Agiri ji yek û nîva xwe nay û xwar, her serbilind û azad e!. Li himber neyaran bû hêlinâ berxwedana Pêşmergên qehremân. Lê dawîya xewna min naye.

Cavê xwe wedikim, li der dora xwe mîze dikim tiştek tuneye.. Havara min li birca Amedê dikeve û şunda wedigere. Kemalîstan bi şikleki din welatê min dagirkiriye, hedi keç û xorten Kurda bi şeweyek ecêb pesnê neyare xwe didin. Kala hevdem buna dijîmîne xwe dikin. Havar Xwedêyo mîrov çawa dikare ji qetîlê xwe hez bike.

Piştî wedigerim ser xwe cardin, gelo em ci dîkin bo ci havara me deng nade? Bo ci kesek me nabîhisê, gelo em pir durin an hedi me qêrîn ji bir kirîye! Bersivek digerim, digerim û cardin têm rastîya xwe. Çiye ev rasti? Rêxistin, rêxistin û cardin rêxistin! Civakek bê rêxistin her dem dê bindest be û tucar nabe xwedîyê tiştekî.

Bersiv eve, rêxistin xurt, demokrat û xwedî prênsib! Ne endam in, endamîn endamî rêxistina xwe ne. Pêşewaziya gelê xwe bike, bibe xizmetkarê Gelê xwe, ne xizmetkarê "serokê xwe"! Mezinbûn ne bi şikl e, bi ked û tekoşîne ye. Di xizmeta mîletê xwe de xebat e, neku bi salan qala xizmeten kevn bikî û hîn di xewn û xiyala kevn de bijî.

Di wê texmî de cardin li me mîze dikim, gelo em li kiderê nin, PDK-Bakur ci dike? Partiyek bi qedr û qîmet ku "Dayika" hemî rêxistinê Kurdistanî ye. (hînek xérnexwaz dikarin bêjin na ne a me ye. Ji xwe ew ne Kurdistanî nin, ew bûnîn nokerê "komara demokratik"!) Bi dilekî gelek eş temaşê dikim, PDK-Bakur ne layiqî vi hali ye.

Sedem çîye, jibo ci em ewqas qels ketin? Em dikarin gelek sedeman nişan bidin. Ya sereke ev rêxistin di serî de ji Serokatiya xwe bêpar ma. Serokê partîyê, parêzer Faik Bûcak piştî salekê bû hedefa dewleta Tirk û ji aliyê dagirkeran ve hat Şehîd kirin. Piştî trajedîya duyemin pêk hat. Şehîdê nemir Serokê Partîyê Saïd Elçi ket nav karwanê Şehîdîn Kurdistanê. Wan bûyeran gelek tehrîbaten mezin di nava partîyê de çêkirin.

Hêviya mîletê Kurd gelek qels bû, dijîmin bi mîranî nedihat ser partîyê lê bi fen û dolaban karê xwe dikir. Lê li himberî wan kiryan partî nekaribû bersivek xurt bide, birina wê xedar bû, ne hêsan bû. Rêxistin ku du serokên xwe winda bike! Lê cardin berdewama xizmeta mîletê Kurd kir. Miron tucar nikare PDK paşçav bike. Partîyê hewl da ku her xizmeta mîletê xwe bike û di şoreşa Gulanê de rolek gelek mezin lîzt.

Dema mîrov qala xebata buhuri bike wê gelek karê baş bê ber çavan, lê ev me xilas nake!! Divê iro ji em bibin bersivek xurt ji bona netewa Kurdistanê. Îmkan û micalen me bi her awayî ji berê bastir e. Edî bayê gur yê Kurdayetiyê biser netawa Kurd de tê. Di vê noktê de divê em hembêza xwe jibo hemî Kurd-perweran vekin û di qada tekoşîne de çalak bibin.

Pêdiwîya me bi firehbûnê heye. Pêwîstîya me bi xebata bi hêzén Kurdistanî re heye. Di vê demê de divê em bi her derfetên xwe hevkariyek baş di nava rêxistinê Kurdistanî de destpêbikin. Yan na, li bakûrê Kurdistanê tu rêxistinê xurt nikare bi serê xwe gavekê bavêje. Jiber vê yekê divê di zûtîrin wext de têkiliya rêxistinê Kurdistanê encamên xebata hevbes derbixin holê. Ez hêvidarim ku wê ev daxwaza gelê Kurdistanê di zûtîrin wext de pêk bê.

# Buroya alîkariya civakî ya Kurdistanê



## Hêvîdar Zana - Duhok

i başûrê Kurdistanê heta niha jî pêkanîna ewlekariya hun dirin pirsgirêka sereke'ye. Lê ev nayê wateya ku ji ber sedema ewlekariyê karekî din nabe û nayê kirin. Di 13-14 salen derbasbûyi de hema bêje temamê saziyên dewleti û civakî hatine avakirin û ew roj bi roj di nava hewldana xwepêşxistinê de ne.

Bêguman ev nayê wateya ku her sazî bi rêkûpêk kar dike û berhemên baş diafirine, lê hebûna her saziyê bersiva pêwîstiyeke dide û civak roj bi roj bi rêkûpêktir dibe.

Yek ji saziyên ku weke binyata dewleteke civakparêz tê dîtin û hebûna wê rê li ber gelek pirsgirêkên civakî digre, "Saziya Geşepêdana Civakî" ye. Li wela-teki weke Kurdistanê ku bi salan ji xizmeta geşepêdana civakî dûr hatiye hiştin, gelek karê ku ev sazî bike heye; Bêkarî, pirsgirêkên perwerdeyi, pirsgirêkên psikolojik, aborî, civakî û geleken din. Bêguman pirsgirêkên insan, nikarin ji pirsgirêkên civaka ku ew tê de dijî cuda werin şirove û çareser kirin. Rayedarê Hikûmetâ Kurdistanê vê rastiyê baş dizanin û li wê gorê di nava hewldana başkirina mercen civakê de ne.

Saziya Geşepêdana Civakî, saziyeke nû ye. Navenda wê li Hewlêre ye û şaxekî wê jî li Duhokê ye. Ev sazî ji aliye Hikûmetâ Kurdistanê ve ji bo karûbarê civakî û alîkarikirina malbaten xizan hatiye damezirandin. Berê bi navê "Sindoqa Alîkariya

Xizanan" kar dikir, lê berî 2 mehan navê wê hatiye guhertin û bûye "Rêvebiriya Geşepêdana Civakî". Sazî girêdayî Wezareta Kar û Karûbarên Giştî ye. Ev sazî 'gelek karan bi hev re dike. Yek ji karênu ku ew pê radibe ewe ku mehane alîkariya madî pêşkêşî hinek malbaten hejar bike. Li gora derfetên ku niha hene ew dikarin li bajarê Duhokê û derdûdora wî alîkariya 9301 malbaten xizan bikin. Ev alîkari ne bi tenê bi awayê peredayinê dibe. Ew li kéléka piştgiriya aborî, bi gelek rengên din jî dest davêjin pirsgirêkên wê malbaten xizan û piştî pêvajoyekê dihêlin ku malbaten bikaribe li ser lingên xwe raweste û debara xwe bike.

Li devera Duhokê 353 xebatkarên vê saziyê hene. Her xebat-karek berpirsyariya 20-30 malbatî hildigre serxwe. Berpirsyarê saziyê yê şaxê Duhokê Fehmî Silêman, dide zanîn ku xebatkarên Saziya Geşepêdana Civakî bi awayekî berfereh hatine perwerde kirin. Ev xebatkarên ku weke "vekolanen civakî" tên binavkirin, her meh serda-na van malbaten xizan dikin, li gel wan diaxivin, li pirsgirêkên wan guhdarî dikin û hevditînê xwe bi awayê raporan hildidin jor. Ew li ser rewşa malbatê ya psikolojik, aborî û civakî radiwestin.

Xebata vê saziyê ne bi tenê alîkarikirina xizana ye. Li kéléka malbatan, ew her wiha alîkariya zarokên bêkes, kal û pîren bêxwedî, kurtebalan (cûce), kêmendaman (ji sedî 75 kor, seqet) û zindaniyê ku lazime bêne perwerde kirin jî dikin.

Saziya Geşepêdana Civakî wan kesen ku di dema rejîma Bees de hatibûn girtin û ziyaneke mezin dîtine, di navendêne taybeti de bi alîkariya psikologan derman dike. Her wiha ew alîkariya maddî didin zindaniyê li girtîgeha Duhokê jî. Fehmî Silêman li vir balê dikşîne ser wê yekê ku li Kurdistanê girtiyên siyasi tunene û girtiyê zindanan tev ji ber dizi û hinek sûcên adlı hatine girtin. Saziya Civakî her meh hinek pere didin wan ji bo ku ew bikaribin debara xwe bikin.

Weke tê zanîn li Kurdistanê bi sedema şerê ku bûye û hîna jî dibe, gelek malbat bê sermiyan mane, ango zilamên malê hatine kuştin û enfalkirin û xwedîkirina zarokên hûr li ser pişta kebaniya malê maye. Saziya Geşepêdana Civakî destê alîkariyê dirêjî wan malbatan jî dike. Fehmî Silêman dibêje ku ew girîngiyeke mezin didin xwendinê û ji bo ciwan bikaribin xwendina xwe bidominin, saziya wan alîkariya xwendevanen zanîngehan yê zewicî û xwedî malbat jî dike.

Li vir, me pirsa xwendevanen ku ji besen din yê Kurdistanê tên kir û me xwest bizanibin ka alîkariya wan jî di aliye aborî de dibe yan na. Fehmî Silêman got ku ew ji bo alîkarikirina xwendevanen agahdariyê pêwîst ji Yekîtiya Xwendevanen werdigrin û heger xwendevanek xizan be, ew lê nanerin ka ew ji ku hatiye û yekser alîkariyê pêşkêş dikin.

Silêman wiha didomîne, "Saziya me gaveke ji bo destpêka jiyaneke civakî ya pêşketi ye.

Ew di pêşerojê de berferehtir bibe. Gelek kesen din jî hene yên ku em dixwazin xwe bigihînin wan û alîkariya wan bikin, lê niha taqeta me nagihê wê yekê ku em yek malbaten xizan bê alîkari nehêlin".

Her malbaten ku serî li saziyê bide û doza alîkariyê bike, yekser nakeve listeyê. Ji bo destnîşankirina malbaten ku bi rastî muhtaci alîkariyê ne, lice-neyeke taybeti hatiye çêkirin.

Ev licne ji muxtar, endamên şaredariyê û vekolanen civakî pêk tê. Ew malbaten xizan destnîşan dikin û agahdariyan di derbarê wan de didin Saziya Geşepêdana Civakî. Bêguman hinek caran neheqî jî dibe û hinek malbaten ne muhtac, bi riya navbeynkarên ku dinasin, alîkariyê werdigrin. Li ser vê pirsgirêkê jî Fehmî Silêman wiha got, "Ez di wê baweriye de me ku ev sazî di aliye navbîniyê (wasite) de ji hemû saziyê Hikûmetê hişyartir e, lê gelek xebatkarên me hene û em nikarin tevan kontrol bikin. Em nikarin bibêjin ji sedî sed heqê kesî nayê xwarin. Hinek caran em pê dihisin ku hinek malbat bêyi ku maf hebin, alîkari wergirtine û hinek malbaten ku pêwîste wergirin, negirtine. Dema em pê dihisin, em yekser dest bi pêvajoyeke yasayı dikin. Daxwaza me ewe ku em edaletê bi cî bînin".

Yek ji pirsgirêkên ku ev sazî dixwaze di demeke kin de çareser bike, pirsgirêka "zarokên karker e". Saziya Geşepêdana Civakî van zarokan ji kolanan kom dikin, pirsgirêkên wan çareser dikin û wan careke din li

xwendinê vedigerînin. Heger malbaten wan nikaribin wan bîdin xwendin, ew alîkariya aborî pêşkêşî wan dikin ku ew bikaribin bixwinin.

Fehmî Silêman li ser vê mi-jarê jî dibêje "Pirsgirêkên me yên aborî li Kurdistanê ne he-wqasî mezinin ku zarok mecbûr bimînin kar bikin. Lê belê têgihiştineke civaka me heye, ew dibêjin heger zarokên me di zarotiya xwe de fêri kar nebin, ew mezin jî bibin kar nakin, ji ber vê yekê ew zarokên xwe li kolanan didin kar kirin. Her wiha zarok bixwe ji malbatê direvin. Malbaten me nikarin pêwendiyek baş li gêl zarokên xwe deyinin, ev jî dibe sedem ku zarok ji malbatê birevin û dema xwe li kolanan biborînin. Li kolanan jî çav li hev dikevin û dest bi karênu ku ne yê wa ye dikin. Gelek caran agahdariya malbaten ji wan nîne ku kar dikin. Li gora yasayê nabe ku zarok kar bikin, lê ew yasa nayê bi cî anîn. Em niha li ser kar dikin ku yasa were bi cî anîn û ev pirsgirêk ji holê rabe. Bi rastî gunehe ku zarokeki biçuk kar bike".

Saziya Geşepêdana Civakî, ji bo malbaten ku du nefer bin 40 hezar dinar û malbaten ku ji du neferan zêdetir bin jî 50 hezar dinaran pêşkêş dike. Ew her meh nêzîkî milyonek dollar pere belav dikin. Ji bo ku malbaten bikaribin ji xwe re dest bi karekî bikin û ji alîkariya "sosyal" xelas bin, Saziya Geşepêdana Civakî heta bi 10 hezar dolaran krêdi dide wan. Lê belê ew piştre mecbûr in vî pereyî di nava 4 salan de bê faîz li Hikûmetê vegerînin.

# Mesûd Barzanî: Ez û Celal Talabanî xwediyê yek nêrîn û yek helwestê ne

Amadekarê programa "Ji Iraq" îlin Kûzî ji bo televizyona El Erebiyê, hevpeyvîne direj li gel Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî çekir. Hevpeyvîn bi zimanê Erebi di televizyona El Erebiyê de hat weşandin. Mesûd Barzanî, di vê hevpeyvînê de xetên sor yê Kurdistan bi awayekî vekirî destrişan dike.

**Pirs:** Ezmûna Kurdistanê tiştekî nû ye. Hinek kes vê yekê weke destpêka cudasbûna ji Iraqê dibînin, rast e?

**Mesûd Barzanî:** Ev yek destpêka rêxistina rewşa me bixwe û çespandina tecrûbeya demokrasiyê ye li Kurdistanê. Çima ji bo her pêşketineke ku li Kurdistanê çedibe, ev şiroveyâ cudabûnê tê kirin? Damezirandina dewleteke serbixe, mafê gelê Kurd yê rewa ye û ne sûc e. Lê belê di rewşa niha de, berjewendiya gelê kurd di wê de ye ku behsa Iraqê federal, demokrat û pirhizbî bike.

**Cenabê Serok, ezê vegekim ser pirsira Iraqê federal û demokrat. Listeyâ Yekgirtî ya Iraqê, Iraqê federal û islamî dixwazin, ew ji ji Iraqâ ku Kurd dixwazin cuda yc. Sala bori referandumek li Kurdistanê pêk hat û ji sedi 97ê Kurdish dengê xwe ji bo serxwebûnê dan. Piştî vê yekê mirov dikare behsa mayina li gel Iraqê bike? Hün weki rôbereki Kurd, dikarin miletê Kurd razi bikin ku ew bibin Iraqî?**

Baweriya min ewe ku her kurdekk xwe weki Kurdekk Iraqê dibîne.

**Ne weki Iraqîyeke Kurd?**

Ev nerîna min e. Mafê miletê Kurd yê rewa ye ku ew bibe xwediyê dewletteke serbixe. Lê cudabûneke mezin di navbera daxwaza mirov û tişte ku dibe de heye. Bê guman ewê piştî çend salan ev daxwaz bi cî were lê ez nikarim wexta wê diyar bikim. Heta ew wext were, emê li ser pirsira Iraqê federal, demokrat û pirhizbî rawestin. Ev ji mafê me ye ku em di çarçoveya vê Iraqê de zortirin mafan bidest xwe ve binin.

**Hinek kes dibêjin, islam hemû mafan di nava xwe de diparêze û piraniya wan di wê nerîne de ne ku ola dewletê, islam be. Wê demê çima nabe ku destûr li gora şerîta islamî were çekirin?**

Ezmûna me vê yekê nabêje. Ezmûna me li gel Iraqê, li gel rejîma borî û her wiha li gel rejîmân berî wê ji tiştekî diye. Gelek caran digotin, em tev bira ne, em misilmanin, lê Islam û Quran li gora daxwazîn xwe şirove dikirin. Di rastiyê de em hemû ji di destpêkê de li ser demokrasiyê hemfikir bûn û ji ber vê yekê ji em hatin cem hev.

**Em dibînin ku Kurd aliyeke mêtînê ne û li ser navê hemû liberalen Şii, Sunni û Kurd diaxivin. Gelo Kurd ji bo bergirtina li prosesên islamî, hêviya aliyeke liberal in?**

Bizava rizgariya Kurdistanê, ji destpêka Şoreşa Ilonê ve serokatiya bizaveke



Wiha kir ku gelek ol, mezheb û neteweyêñ cuda têde besar bin, ji ber vê yekê meseleya demokrasiyê ji bo me bûye besek ji kultûr û rewşenbiriya me. Di sistema demokrasiyê de, misilman, nemisilman û laik (ilmani) dikarin bigihijin mafen xwe. Kurd ji sistema demokrasiyê, pêve tu sistemê din qebûl nakan. Eger sistemeke din li ser me were ferzkirin, bi baweriya min Iraq hevgirti namine. Ez vê pişkere dibêjim.

**Pirs Kerkükê ji heye, ew niha di çi radeyê de ye?**

Li ser pirsira Kerkükê me soz ji Emerika, Brîtanya û Hikûmeta Iraqê wergirt ku madeya 58 were bi cî anin, serokwezirê Iraqê hat guhertin, lê lazime ew soz were pêkanîn.

**Tê gotin ku girêdanek di navbera te û Celal Talabanî de heye. Mam Celal weke Serokkomarê Iraqê roleke cuda dilize û hineki nerm e. Lê di mijarên girêdayî mafen Kurdistan de tu bixwe helwesten tûnd werdigri. Ev yek di nava hikûmeta navendî de weke manewrayeke siyasi û orkestrayeke rekkistî tê dîtin. Ji bo hinek babetan Mam Celal dibêje, "Kak Mesûd tund e û razi nabe".**

Birêz Celal Talabanî, serokkomarê Iraqê ye û ew ji temamê Iraqê berpirsyare. Li derdora pirsên girêdayî Kurdistan, danûstendina me li gel hev heye. Bi hukmê cihê ku ez lê me, ez behsa mafen Kurdistan dikim, ji bo pirsên serekî û stratêjik em herdû alî ji xwediyê yek nerîn û yek helwestê ne.

**Lê em pê dihisin ku tu tûndtirî. Mebes ta min ewe ku tu di derbarê mafen Kurdistan de tundî û pir dûr diçî. Di hinek meselen de tu derfeta gotûbêjî ji nahêli.**

Birêz min, ez bi vî rengî li meselan dinlerim: Rejîm hilweiya, em niha amadekariyên damezirandina Iraqê nû dikin û Kurdistan ji bi sedan salan nexweşî dîtiye. Dema ku piştî şerî Cihanê yê Yekemîn dewleta Iraqê hat damezirandin, wan gelek soz ji bo me dan. Iraq bi şertê ku çavdêriya mafen Kurdistan bike, bû endamê Civata Miletan. Lê encama wê ci bû? Kurd ji hemû mafan hatin bêpar kirin, 4500 gund hatin wêrankirin, bi çekêñ kimyewî lêxistin, 182 hezar kes

enfal kirin. Ji bo vê yekê ev firsendeke ji bo me ku em mafen Kurdistan di çerçovaya destûr û yasayê de misoger bikin. Çenabe ku em tenê bi sozan razî bibin, divê her tiş zelal be û nivîsandî be. Eger em vê fersendê wenda bikin, kî dibêje ku ewê careke din vegere. Ev berpirsyariyeke diroki ye li beramber Xwedê û gelê Kurd. Rewşa iro ne ewe ku mirov daxwazîn xwe vesarti bibêje, divê hertiş vekirî be û ez ji hertişti vekirî dibêjim.

**Wê demê ew gotinê ku tu bikartini, ji bo pirsên ku pêwîste werin çareserkerin şeweke diplomasyê ye?**

Heger di derbarê pirsira Kerkükê de be, me li ser paragrafa 58an li gel Hikûmeta Iraqê li hev kiriye û em jê danakevin. Pirsira federaliyê, taybetmendiya Kurdistanê, pirsira Kerkük û Pêşmergeyan nayêñ gotûbêjî kirin. Ev pirsên wiha ne ku pêwîste em di derbarê wan de rastgo û zelal bin.

**Cenabê Serok, tu dibêji ev pirs nayêñ gotûbêjî kirin, lê em dibihîsin ku li ser Kerkükê, taybetmendiya Kurdistanê û hebûna Pêşmergeyan hîna ji gotûbêjî dibe.**

Me raya xwe got û helwesta me zelal e, Pêşmerge dimîn û tu hézek nikare wê ji holê rake, pirsira Kerkükê lazime were çareser kirin, yan na wê xerabtir bibe, pirsira federaliya Iraqê ji tiştekî wiha ye ku nabe mirov jê vegere, taybetmendiya Kurdistan ewe ku Iraq ji du neteweyêñ serekî pêk hatiye, ew ji gelê Ereb û gelê Kurd e. Ev gotûbêjî ji aliye me ve hatiye girtin, heger hinekî din hîna li ser van pirsan nîqaşê dikin, ew pîrsîgirêka wan bixwe ye.

**Ev tiş xetên sor in ji bo we, yanî bi tu rengan hûn nikarin xwe nerm bikin?**

Bi tu rengan nabe. Her cure nermûnek tê wateya xwe kişandina ji doza mafen rewa. Birayê min, em xwediyê mafen damezirandina dewleteke serbixe, eger me dest ji wî mafî berdabe, çawa dikarin van daxwazîn me ji bo me zêde bibînin?

**Di dema avakirina Hikûmeta Iraqê de, hinek aliyeke siyasi hatin cem cenabê te û ji te xwestin ku tu bi wezifeyeke bilind di hikûmete de besdaryê bikî, lê te**

ev yek nepejirand, ev nayê wateya ku baweriya te bi Iraqê tuneye?

Ez li Kurdistanê dikarim zêdetir xizmeta Kurdistan û temamê Iraqê bikim û ez dikarim piştgiriya Iraqê federal, demokrat û pirhizbî bikim, lê pir ekere dibêjim, eger Iraq ne federal, demokrat û pirhizbî be, tu pêwendiyeye min pê re namine. Rewşa Bexda ji bi şeweya karkirina min nayê guhertin.

**Çend rexneyek li Serok Barzanî hat girtin û hat gotin ku wî di dema sündxwarina ji bo Serokatiya Herêma Kurdistanê de, navê Iraq neaniye ser ziman, çima di sündxwarinê de navê Iraqê derbas nebû?**

Sündxwarin ji bo Herêma Kurdistan bû, ez ne serokê Iraqê me, ez serokê Herêma Kurdistanê me.

**Çima we li her derê alaya Kurdistan bilind kiriye û alaya Iraqê tune ye?**

Me gelek caran nerîna xwe ji bo vê yekê gotiye. Ez careke din ji dûbare dikim, me xwest ku alaya serderma Melik, yan ji alaya komarı ya 14 Temûzê were hildan, lê ne alaya Hizba Bees û Seddam. Birayê Encûmena Hukum û yên piştî wan ji guh nedan van pêşniyaran, bi tenê fonten nivîsına "Allah û Ekber" guhertine. Di bin sîbera wê alê de, tawanêñ mezin li berambî gelê Iraqê û gelê Kurd hatine kirin. Em nikarin wê alayê bilind bikin. Ew ala sembla demeke reş, tawan û trajediye. Heger alayeke nû ji bo Iraqê were çekirin, emê bilind bikin, lê bi awayekî vekirî dibêjim; heta ku ev ala alaya Iraqê be, ewê li Kurdistanê neyê hildan.


**Serokê Birêz, niha gelek xewnen Kurdistan hene û mafê wan heye ku van xewnan bibînin. Lê Erebê Iraqê ji wê xewne dibînin ku ewlekariya Bexdayê ji weke ya Kurdistanê be. Hün dikarin vê aramiya Kurdistanê li Bexdayê ji pêk bînîn, yan ji dibe ku Iraqî sûdê ji ezmûna Kurdistan wergirin?**

Piştî rûxana rejîmê, ez û Serokkomarê Iraqê Birêz Celal Talabanî em cûn Bexdayê û me amadebûna xwe nîşan da ku em ezmûna Kurdistan derbasi Bexda ji bikin. Piştre bîryara 1483 derket û rewş hat guhertin. Hêzên rizgarkirina Iraqê bûn "hêzên dagirker". Wan dosyaya ewlekariye xistin destê xwe. Ez ji di wê baweriye de me ku rewş aloz e. Çareserkerina vê pîrsîgirêkê gengaz e, lê zehmete. Em amadene niha ji li herdera Iraqê alikariya pêkanîna ewlekariye bikin. Ew ji bi şertê ku hesasiyet çenebe û kes nebêje ev şerê Kurd û Erebâ ye.

**Hün çawa dikarin van sinorêñ fereh yê Kurdistanê ji terorîstan biparêzin?**

Cara yekê divê were gotin ku ev serketina miletê me ye, ji ber ku gelê me alikariyeke mezin bi dezgehîn ewlekariye re dike. Di heman demê de dozek heye ku baweriya wan pê tê. Ew pê dihisin ku ev welat welatê wan e.

# Rûyê reş yê şoreşa 1908an



## Ayşe Hür

**K**esën ku modernbûna Tirkan bi Selimê IIIyan û di sala 1839an de bi hatina ser text ya Evdilmeçid didin destpêkirin jî hene, yên ku di sala 1876an de bi danezana (ilan) Meşrutiyeta I. didin destpêkirin jî hene. Jibo Aykut Kansuyê ku hefta buhûrî di van sitûnan de nivîsandibû, "destpêk" di 23ê Tîrmeha 1908an, danezana Meşrutiyeta I. bû. Birasti jî ev bûyer yek ji zîrveyen Türkperestiya siyasiye. Jixwe di 23ê Tîrmeha de (1919) destpêkirina Kongreya Erzeromê ya ku ji 61 beşdarén wê 34 kes İttihadi bûn jî ji aliye neteweperestiya Tirkan ve işaretekê giringe ji bo wateya sembolik ya vê tarixê. Şoreşa 1908an ji aliye nivîkar ve weke bûyereke ku "diroknesiya me ya muhafazakar bi me bide jibirkirin" tê bibiranîn û ji nava bûyeren ku mizginya şoreşê didin, bitenê qala serihandanê salyane (vergi) yên ku di sala 1906an de destpêkirin dibe. Ew bi yek gotinê jî qala serdemê berê nakek û ew (heta bi avakirina bender û riya hesinî ya ku di serdema Evdilhemid de destpê kiribû jî dixe piştî 1908an). Ew di derbarê wê serdemê de, yek bûyereke xirab û xeletiyekê jî naniyîsine. Ev ji dibe sedema ku ji nivîsara wi û şûnde ji "diroka fermî ya diroka nefermî" pêve tu tam nemîne.

Wek tê zanîn, di wan deman de ji ber ku bûrjuvaziya Tirkan hê têra xwe giloxe nebûbû (palazlanmak), li ser navê wan, pêşengiya şoreşê ji aliye wan kesen ku li Tibbiye, Harbiye û Mulkiyê perwerde dibûn, dihat kirin. Leşker û sivilên ku li Balkanan bûbûn xwedîye ezmûnen çetekariyê pêşengî birêve dibirin. Belê, welat ji rêvabiriya Padışah ya mutlak rizgar bûbû lê ew ket bin hukmê Firqeya İttihad û Terakkî ya ku li ser navê "millet-i hakime" bi piştgiriya meclis û artêsek kûkla xwe ji etnîsîteyê

din bilindtir didit. Anglo hê di destpêkê de xwe ji prensiba "musavat" (wekhevî) dûr xistin. Hê bêtir, wek mebûsê Dêrsimê Lutfî Fikri Begê jî gotibû "FîT qelebâlixek ku di bin dimena partiyeke siyasi de piştgiriya hukumatê dikir" bû û xwedêgiravi di vê partiyê de bend di destê hîzba Enver, Talat, Cemal paşan, Halî Beg (Menteşe), Bahaddin Şakîr, Dr Nazim û Cavid Beg de bû. (Biryara ketina Şerî Cihanê yê yekê, ji aliye çar merivê destpêkê ve beyî şêwirandina bi partiyê, hukumatê Padışah hat dayin)

## Mîrata Dewleta Kûr

Distûra "serbestî" yê jî zêde nejiya. Di 16ê Tebaxa 1909an de derxistina Zagona Komeleyan ya ku azadiya komîteyên müxâlif bisînor dike, di 17ê Hezîrana sala 1909an de derxistina Zagona ku sînor jibo civîn û xwepêşandan datîne, di 23ê Tîrmeha 1909an de -berovajî imaya nivîkar-derxistina Zagona ku jibo azadiya çapameniyê sînor danîn, dîtina çareseriye di danîna rêvabiriyê rewşa awarte de û bi kuştinê "kujer nedîyar" goribûna rojnamevanê dijber yên wek Hasan Fehmî, Ahmed Samîm û Zekî Beg li ser ramana azad hecir hate danîn. Nivîkar dide xuyakirin ku li hemberî meylîn muhafazakar yên serdest, pêkanîna "hilbijartinê bi dar" yên 1912an mecbûriyetek bû. Di 23ê Çileyê sala 1913an de, bi darêzorê rûxandina Hikûmeta Kamîl Paşa bû işaretet zordarî û derbkariya FîT. Piştî derbeyê dema ku Kamîl Paşa ji bo gili û gazinê xwe bike çû Kahîreyê, Lord Kitchner jê re got ku wê ev kar zêde dirêj neke. Lê FîT karîbû heta dawiya Şerî Cihanê yê I. li ser text bimîne. Li piştî vê serketinê, Teşkilatê Mahsusa ya di bin fermardariya Enver Paşa de hebû. Hejmara endamên rîexistinê di sala 1916an de gîhiş 30 hezari. "Yên ji dozê vedigeriyan" bi gulleyê

fedaîyan dihatin kuştin. Di encam de, yekem mîrata ku ji Şoreşa 1908an (ya ku demxeya İttihad û Terakkî li ser bû) jibo iro maye; rewşenbirêni ji gel ne bawer, leşkeren ku mafê destdirêjiya siyasetê bi xwe re dibînin, derbekarı, kuştinê kujer nedîyar û adeta "dewleta kûr" e.

Mîratek din ya ku ji İttihadiyan ma, peyva "dijminê navxweyi" bû. Li gor Ahmed Belevî Kur'an, "Li cem Navenda Giştî (merkezi umumi) ya FîT Bulxar, Sirp, Rom û Ermen dijiminê welêt bûn; Ereb, Alban û Kurd jî xayîn bûn. Tirkênu dijberi jî dikirin, xwefiroş bûn". Li gora serokê Teşkilatê Mahsusa Kuşcubaşı Eşref jî "kesen nemisilman girêbayên (tümör) hundurîn" bûn. Ev rewş nîşana dûrketine radikal jî sisteme pirçandeyî (çokkültürlü) ya Osmaniyan bû. Yanî édi "ühûvet" (birayeti) nemabû. Roj roja ji tuneyî afirandina netewa Tirk bû. Di rastiyê de berdevkê neteweperestiya siyasi ya Tirkan Yusuf Akçora gotibû, Tirkênu Osmanî yên herî rewşenbir jî têde, ew ne xwedî agahdarî ne û nizanîn ka Tirk li ku dijîn, çawa debara xwe dikin, çawa dipeyivin, ci difikirin, ci dijin û dixwazin ci bikin. Heta ji bo gelek kesan ji me sînorê Tirkîtiyê ji Enqere û Konyayê wê de naçe". Komên etnîki yên navborî ji ber daxwaza mafê muxtarî an jî serxwebûnê dewlet aciz dikirin û jiber ku dewlemend bûn jî Tirkênu nemisilman aciz dikirin. Di sala 1909an de li Edenê ji aliye gelê nemisilman ve talankirina mal û kargehêni Ermenan, encama vê çavtengiyê bû. Peyadeyên Artêşa 3. yên ku ji bo pêşîya talanê bigrin ketibûn bajêr jî, dest bi talanê kirin û 21 hezar Ermenî hatin kuştin. Mebûsê Tekirdağê Hagop Babikyan ku li ser daxwaza Meclisê raporek amede kiribû, tê de gotibû: "Divê ez bi xemginya xwe ya kûr bêjim ku endamên İttihad û Terakkî li organizekirin û pê-

kanîna tevkûştina Edenê de cîh-girtine." Dema ku Ziya Gökalp digot; "Wê welatê dijmin wêran bibe! Wê Tîrkiye mezin bibe û bibe Tûran," ne xelet bû. Li vê derê divê em berê xwe bidin gotina Aykut Kansu ya ku dibêje, "Di dema saltanatê de dîmena perçê perçeyiya bazara Tîrkiye hatibû guhartin".

## Sîrgûnên Yekem



Li gor diroknaşê Fransî E. Driault "Ji 1910an û vir ve Contirkan, li seranserê İmparatoriyê dest bi nêçîra mal û bazirganen Roman kirin... Perçiqandina reayayê Rom û li ser hemû axa İmparatoriyê kuştina bazarganiya Rom mijara gotinê bû". Konsolos August Boppe raporek ji bo Parîsê şand û tê de wiha got, "Kerba Roman gihiştiye radeya herî jor. Edî Tirk naxwazin Roman bibînin. Wan heya mirinê dijminen tîrkan dibînin". Sedema bêaramiyê ya li ber çav ew bû ku Girit bi Yunanistanê re berbi enosîs diçû. Di rewşekê de ku Mehmed Emin Yurdakul bi gotinê weke "Ez Tirkîkim, din û nijada min berz e/ Sing û hundîre min bi êgir dagirti ye/ Yê ku mirov be xulamê welatê xwe ye/Kurê Tirk li mal nasekine, ezê biçim" gel bi xeleyanê xistibû, di mîzgeftê "İzmîra Gawir" de melan jibo ku kirîna malê nemisilmanan bê boykot kirin dest bi wazan kiribû. Bi şev dukanen Roman bi boyaxên rengîn hatin nîşan kirin. Ji bo hemû saziyên dêmanî û biyani ferma jîkarderxistina Roman hate dayin. Dixwestin bi lez "Burjûvaziya netewi" bi-afrînin. (Zagona Tatîl-i Eşgal ya ku grev qedexe dikir, du sal berê hatibû derxistin.) Balyozê Emerikayê Morgenthau bûyêrê weha şirove dike: "Tirkan li dijî hemû Xiristiyanan, ne bitenê li Asyaya Piçûk, li Stenbolê jî dest bi boykotê kirin... Min ev boykot wekî nîşana berevajîcûyîna saziya millî ya Tirkan dit. Jiber

ku vî neteweyî li dijî bende-ganen (uyruk) xwe dest bi boy-kotê dikir."

Piştî du salan bi hawarêne weke "Em Osmaniye ku xofe didin cîhanê ne/Biji Artêş bijî ceng/Erîş li ser Filibey! Erîş li ser Sofyayê" ketin Cenga Balkanan. Ev ceng, bidestxistina talan û xenîmetan li aliyekî, bi windakirina mirov û erdîn mezin bi dawî bû. Liderên İttihatçı yê ku bi piranî ji welatê Roman (Rumeli) bûn, ketibûn nava velîskê (şok). Şiretên weke "Bila bibe guhar di guhêne te de /Hey misilman qet xwe nexapîne/Dilê xwe ji tolhildanê sar neke" dida xuyakirin ku İttihadiyan bîryara pakkirina Anatolyayê ji nemisilmanan dabûn ji ber ku ew weke sedemê têkçûnê dihatin dîtin. Armanc ew bû ku him liser mal û milkê nemisilmanan rûnin û him jî mexdûrên Balkanan li ser erdê wan bicîh bikin. Bi avakirina Teşkilat-î Mahsusa gavê despêkê li Egeyê hatin avêtin. Bi gotina Celal Bayar, heta 1914an li herêmê 130 hezar Rom bi darêzorê sîrgûnî Yewnanistanê hatin kirin. Di heman demê de ji bajarên Rojhîlat, yekem sîrgûnên Ermen, Suryanî û Ereban destpê kir. Di sala 1915-16an de sîrgûnî Ermenan û di 1916an de diwemîn sîrgûniya Roman pêk hat. Kinik, Bergama, Dikili û Ayvalık ji bo koçebêrên misilman hate vebirtin. Li gor Cemal Kutay Kuşcubaşı Eşref, ji herêma Egeyê milyonek û 150 hezar Rum-Ermenî sîrgûn kiribû. Romên mayî jî wekî Ermenên Rojhîlat (Kurdistan) li tabûrên emeleyan telef bûn. Yewnanianan di 1920an de Ege dagirkirin û hêvi dikirin ku tola van kirinan hilgirin. Encam, hilwîşnek mezintirîn bû. Bi kurtî, ev û gelek bûyêrên din, wekî ku Aykut Kansu jî destnîşan dike rûyê tarî yê Şoreşa "Tirk" ya sala 1908an afirand ku mohra xwe li çanda me ya siyasi xistiye.



# Li Kurdistanê şaheserek dîrokî ya Suryaniyan: Dêra Zaferanê



**Amadekar:**  
**Mehmet Çetintaş**

Dêra Zaferana ku piştî zayînî di sedsala 5. de avabûye, bi mîmariyek muhtesem navendek ji ya dêra Suryaniyan. Heta sala 1932an 640 salî wek ikametgeha Patrikê Suryaniyan Ortodoks bû. Dêra Zaferanê 4 kilometre dûrî bajarê Mêrdinê ye û di qûntara çiyayekî şérîn de avabûye. Dêra ku ji sê qatan pêktê û ji sedsala 5. û vir de bi tamîratên cûrbecûr şiklê xweyê iro stendiye. Mîmar û hosteyen wê demê bi awayekî wilo dêr tamîkirine ku mirov dibêje qey dêr di demek pir nêz de hatiye avakirin. Dêra Zaferanê, berî zayînî wek pîrozgeha agirperestan û di dema Roma de ji wek keleb dihat bikaranin. Piştî ku Roma xwe ji herêmê bipasde kişand, Azîz Şleymûn hestiyen hinek Azîzan anî vir û ev cih kir dêr.

Jiber vê berê dêr, wek dêra Mor Şleymûn dihat zanîn. Piştî ku Metropolitê Mêrdin û Kefertûtê Azîz Hanano di sala 793an de dêr bi berfirehî tamîr kir êdî ew wek Dêra Mor Hanano hat binavkirin. Di sedsala 15. de jiber ku li derûdora dêrê zaferan (safran) hêşin dibû, navê wê bû Dêra Zaferanê

Dêra Zaferanê ya ku bi stûnên kemberî, qubbe, kevirên desteneqşî û bi hostatiyek şahane hatiye avakirin, bi dîroka xweya dirêj yek ji navendê perwerdeya dêra Suryaniyan bû. Ligor tê gotin kesê ku çapxaneya ewilin anije vê herêmê ji

Patrikê vê dêrê Petrûsê 4. e ku di 1895an de çûye ser heqîya xwe. Petrûs, di 1874an de di serdanek Brîtanyayê de çapxaneyekê dikire û di 1876an de tîne Dêra Zaferanê bicîh dike. Bi vê çapxanê di Dêra Zaferanê de pirtûkên bi zimanê Suryanî, Erebî, Osmanî û Tirkî û heta sala 1953an ji kovarek mehane bi navê Oz Hikmet dihat çapkiran. Hinek ji parçeyen wê çapxanê hîna ji li Dêra Zaferanê û dêra Mêrdinê tê pêşangekirin. Dêra Zaferanê iro ji navendek olî ji ya Suryaniyan. Dêra Zaferanê ikametgeha Metropolitê Mêrdinê ye û ji hîla hemi Suryaniyan û gellek tûristan ve tê ziyaretkirin.

## Parêzgeha Rojê

Dîroka avabûna wê nexuyaye. Tê texmîkirin ku Parêzgeha Rojê berî zayînê ye û bi avakirina bajarê Mêrdinê ve girêdayî ye. Ev avahî wê demê wek Parêzgeha Rojê dihat bika-

ranîn. Parêzgeha Rojê li rojhila ta Dêra Mor Hanano ye û ji du beşan pêktê. Beşê ketina hindur aqidkiriye û serûberê wê 25 metreçarçiqil e (metreqare). Beşê diduyan ji 51.5 metreçarçiqil e û binzikê wê pir balkêş e. Binzikê beşê duyem bi kevirên rast û mezin bi awayekî geometrik lihev hatine edilandin. Bêyi ku xerc, qûm, kils û malzemeyê din tevlîbibin kevir bi hostatiyek mezin lihev hatine edilandin û spartine hev.

## Mala Azîzan (Beth Kadîse)

Ev avahî li başûrêrojhilata Dêra Azîz Hanano (Dêra Qubbe) dikeve. Bilindiya wê 10.5 û firehiya wê ji 5.4 gaz e (metro). Dîroka vê avahiyê heta bi sedala 5. dadikeve. Lî beşen derive di 1884an de ji alî Petrûsê 4. ve ji nûve hatiye cebirandin (tamîkirin). Hestiyen gellek Azîz, Patrik û Metropolitan li vir veşartine. Ji 7 nişteyan 4 ên Metropolitan

û 3 ji yên gorên Patrikan e. Liser van gorên Patrikan kîtabeyek ji mermer heye û têde navê Patrik 2. Cercis (1708) û Patrik Petrûs 4. (1895) hatiye nivîsandin. Li bakur liser gorên Metropolitan ji Mor Grigoriyûs Behnam (1846), Mor Filuksînos Hanna Dalabanî (1969) hatiye nivîsandin. Di vî beşî de motifên kevir û guldankan (vazo) pir balkêşin. Hinek diwarên wê bi qakîlîn heywanen avî û wêneyen wan hatine xemilandin. Ligor gotinan wextekî ev ode (mezel) jibo zanyariya tendirustiyê dihat bikaranin.


## Dêra Mor Hanano (Dêra bi qubbé)

Dêr, di dema İmparatorê Bîzansiyen Anastasiüs de, piştî zayînê di 491-518ande ji alî herdu brayen Suryaniyan mîmar Theodosiüs û Theodore ve hatiye lêkirin. Firehiya dêrê 12.3 û bilindiya wê 17.7 gaz e û berfirehiya wê ji 271 metreçarçiqil e. Jiber ku qubbeyek wê wek xaçê hatiye lêkirin jê re Dêra bi Qubbe ji dibêjin. Di vî beşî de figur û wêneyen heywanan balkêş in. Wekî din wêne û tasvîrê Azîz Hanano yê ku di 793an de ev dêr restore kiribû ji dikeve berçavê meriv. Devera ku tiştîn ayînê lê dimînin (kdûşkûdşin) di 1699an de hatiye çekirin. Di nivîsa liser stûnan de dixuye ku ev never di 793an de ji alî Metropolitan Mêrdin û Kefertûtê Azîz Hanano ve hatiye çekirin.

Kdûşkûdşinê heyî di 1942an de ji alîyê hosteyen Suryaniyan Mêrdin û Midyadê ve ji kevirên zer û şekirî hatiye çekirin. Di beşê ana apsis de du kursiyan balkêş hene. Ev kursî ji dara gûzê ne û tê texmîkirin ku temenê wan 350 sal e. Ev kursî ji alîyê Patrikan ve tê bikaranin. Kursiye ku li başûr dimîne ji alîyê Metropolitan ve tê bikaranin, ji diranê filan çekirîye û temenê wê 500 sal e. Deriyê rojavayê dêrê ji dara gûzê ye û ew ji 500 salî ye. Liser derî helbestek Azîz Balay heye ku bi zimanê Suryanî hatiye nivîsandin û herweha beşek ji mezmûren Dawid Pêximber ji heye.

## Dêra Meryem

Dêra Meryem li bakurêrojhilata hêwana mezin dimîne û wek dêra ewil tê hesibandin. Di dema Patrik 2. Cercis de (1686-1708) hinek ji beşê dêrê hatiye cebirandin. Ji 153 metreçarçiqil pêktê. Di beşê apsis de mozaikên dema Bîzansiyen hene û hinek ji diwarên wê ji ji tûxlayen dema Bîzansiyen ve hatine çekirin. Di hindurê dêrê de 3 kdûşkûdşin û 3 deriyen ku di 1699an de bi destan hatine çekirin hene. Liser van derîyan ji ji mezmûren Dawid Pêximber rêzikên bi zimanê Suryanî hatine nivîsandin. Di vê dêrê de jibo mirovîn reşîd û kamil ciyê waftizê heye û ev dêr di roja me de ji jibo merasimên waftizê tê bikaranin.



# Xwarina fêkiyan

## İhmal nekin



Pisporên tenduristiyê radigihînin ku mîwe û sebzeyén havîni jîbo bedena mirov gelekî girîngin, çermê însen diparêzin, û rî liber bêmecâli û zeifbûna hiş digirin.

